**LI SER JINÊN EZÎDÎ BANDORA 74 FERMANAN Û METIRSIYÊN FERMANÊN NÛ**

**Çand û Baweriya Ezdayetî**

Çand û baweriya Ezdayetî, yek ji çandên xeta şaristaniya demokratîk ku di axa Mezopotamyayê de, bi hêz û felsefeya çanda makexwedawend xwe xemilandiye. Gelek lêkolîn didin nîşandan ku, dîroka çand, felsefe û baweriya Ezdayetî beriya şaristaniyên dewletî û olên yekxwedayî diçe û formekî baweriyê ya resene. Ango dikare weke senteza çanda civaka komûnal ya resen û baweriyên yek-xwedayî were bidestgirtin. Dema bingeha ku Ezdayetî tê de welidiyê û xeta ku tê de belav bûye were bidestgirtin, dê were dîtin ku yekemîn cîh û warên civaka dêxwaz û di heman demê de yekemîn cîh û warên şaristaniyê de, şopên Ezdayetî hene.

Di çanda civaka Ezîdî ya resen de, jiyan-bawerî-civak-rêûrismên olî di nava hev de têşe digire û ew yek herî zêde li derdora hebûna jin-dayîkê de tê hûnandin. Hemû pîroziyên-tabûyên-rîtûelên-gotinên civaka dêxwaz ku li derdora nasname û hebûna jin de avabûye, di nava çanda Ezdayetî de cihê xwe digire. Ji mîtolojiyên afirandina însan heta bidestgirtina xwezayê, ji rîtûelên çêbûn û mirinê heta baweriya bi enerjî û anîmîzmê, piştrastkirina vê yekê dikare were dîtin. Hebûna Jin, pêşengî û rêveberiya jin, di çanda resen ya Ezdayetî de diyarkere. Di çand û baweriya Ezdayetî de, zilm, xwe ferzkirin nînin, berovajî di nava aştî û aramiyê de jiyan kirin weke felsefe li pêşe. Di heman demê de berxwedan û parastina motîfên çandî û baweriyê pir di pêş deye. Ji ber vê yekê, ji dîroka şaristaniyên navendî avabûye heta roja me yê îro, civaka Ezîdî herdem bi êrîşên qirkirinê re rûbirû maye. Çi ji milê fizîkî be, çi jî milê çandî-baweriyê de be, êrîşên qirkirinê, ji seranserê dîrokê dikare were xwendin. Sepandina bi zorê guherandina ol, destwerdanên li ser formên jiyanê rû dane. Di nava wan êrîşên qirkirinê de, ya herî zêde zirar dîtiye dîsa jin û zarokin. Ji ber ku jin berdewamî û parazvanê çandê ye, weke hafîza û bîra dîroka civakê ye, berdewamiya civakîbûnê ye, ji bo holê rakirina çand û baweriya Ezdayetî jî, jin bi taybet hedef hatine girtin. 74 fermanên ku bi destê xeta şaristaniya dewletî hatiye ser Ezîdiyan de, ya ku herî zêde hatiye qetilkirin, esîr girtin, tade li ser hatiye meşandin jine. Taybetî Fermana 74'an de (03.08.2014), bi destê DAÎŞ'ê bi hezaran jinên Ezîdî hatin qetilkirin, hatin revandin, tecawiz kirin, weke koleyan di bazaran de hatin firotin. Ango di civaka Ezîdî de, ya ku têşe daye çand û baweriyê jî jine, ya ku di encama jenosîdan de herî zêde hedef hatiye girtin û hatiye qetilkirin jî jinin.

 

Ji ber ku ne tenê bi bandoriya fermanan, yek ji baweriyên ku ji xeta şaristaniya navendî herî zêde bandor bûye, Ezdatiye. Ew yek di seranserê dîrokê de, bi awayeke plankirî hatiye rêvebirin. Ji ber

taybetmendiyên xweyê dijî-pergalî herdem di bin êrîşên desthilatdarî û mêrsalariyê de maye. Polîtîkayên qirkirinê herî zêde helandina civakî-çandî-baweriyê armanc kirine, ew yek hiştiye ku di nava avasaziya civakê de jî, guherînên neyînî pêşbikevin. Gelek taybetmendiyên çandên xerîb û derve bi awayekî plankirî di nava çandê de hatiye bicîh kirin, ger berxwedanekê li beramberî vê were raberkirin, ger rêbaza helandin û bişavtinê negire, rêbaza Jenosîdê ketiye meriyetê. Di nava fermanên domdar de, tinekirina hafiza weke armancekî esasî hatiye plankirin. Bi bandora wan êrîşan, civak di nava sedan salan de, bi hewla xwe ji fermanan parastinê, xwe ji derve re girtiye û formên xweyê bawerî û çandî girtiye parastinê. Piranî lêkolînên di derbarê Ezîdiyan de, behsa girtîbûn û dogmatîzma civaka Ezîdî dikin. Li vê derê, yê ku girtiye ne formên baweriyê ne, hewla parastina formên bawerî û çandî ne.

**Di Dîrokê de Fermanên Li Ser Civaka Ezîdî Hatine Meşandin**

Ezîdî ji qirkirinên jiyan kirine re dibêjin ferman, ji ber ku her qirkirinên jiyan kirine, bi destê desthilatdar an jî dewletekî jiyan kirine. Ferman weke peyv jî tê wateya emir kirin. Lê di rastiya civaka Ezîdî de, tegîna fermanê emir an jî qirkirinê derbas kiriye û naverokekî nû qezenc kiriye.




Li gorî qeydên fermî civaka Ezîdî bi 74 fermanên mezin re rû bi rû mane. Lê ew tenê fermanên ku ketine dîroka fermî ne. Hejmara rast ya qirkirinên li ser civakê hatine meşandin, ji yên ku tên zanîn pir zêdetire. Di hemû fermanan de; çand, bawerî, dîrok û erdnîgariya civaka Ezîdî hatiye hedef girtin. Li gorî tê zanîn hejmara civaka Ezîdî di encama fermanên domdar de %90 kêm bûye, Ezîdî ji bo xwe ji fermanan rizgar bikin, piranî li derveyî welat, welatên parzemîna Ewropa û Emerîkayê belav bûne. Dîsa li Rusya û Ermenîstanê hejmarekê mezin Ezîdî jiyan dikin.

Di erdnîgariya ku civaka Ezîdî tê de jiyan dike de, gelek dewlet, desthilatdarî û olên yekxwedayî derketiye holê, her desthilatdarî an jî olekê xwestiyê di çand, bawerî û terzê jiyanê ya civakê de gûhertinan çêbikin, lê civak li beramberî wan êrîşan li berxwe daye. Di encama vê yekê de, ji ber ku bîat nekirine, di derheqê wan de 74 car ferman hatiye derxistin û ji qirkirinê hatine derbaskirin.

Çend Fermanên ku li ser civaka Ezîdî hatine meşandin;[1]

| | DÎROKA FERMANÊ | KIRDAR | CIH | BUYER |
|---|---|---|---|---|

[1] Mehmet Ozcan-Zarokên Rojê Ezîdî

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 1 | 906 | Dewleta Abbasî Waliyê Musilê Hemadanî | Şengal | Hezar malbatên Êzîdî yên Îslamiyetê qebûl nekirin hatin qetil kirin |
| 2 | 980 | Waliyê Musilê-Hemadanî | Colemêrgê | Mirovên ne misilman an bi daran ve hatine daliqandin an jî serê wan hatine jêkirin |
| 3 | 1107 | Artêşa Selçukiyan-Melîkşah | | Bi hezaran Ezîdî hatiye qetilkirin |
| 4 | 1245 | Dewleta Moxolan | Şehrezor | Bajêr hilweşandine û bi hezaran Êzîdî qetil kirine |
| 5 | 1254 | Bedreddîn Lûlû (Begê Mûsilê) | Herema Şêxan | Hezaran êzîdî hatin qetilqirin |
| 6 | 1221 | Dewleta Selçukiyan | Şengal | Şêx Hesen pêşengê Êzîdî hate revandin û darvekirin. Piştî cihên Ezidiyan ên pîroz hatin wêrankirin. |
| 7 | 1640-1641 | Dewleta Osmanî Fermandar Melîk Ahmet Paşa-Waliyê Amedê | Şengal | Êzîdî qetil kirin |
| 8 | 1647-1648 | Dewleta Osmanî Waliyê Wanê | Şêxan | li hember Êzîdiyan komkujî pêk anî |
| 9 | 1715 | Dewleta Osmanî Waliyê Bexdayê Hesen Paşa | Şengal | Şêx Mîrza esîr hat girtin û hat darvekirin û |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | | | | li hember Êzîdiyan komkujî pêk anî |
| 10 | 1733-34 | Dewleta Osmanî Ehmed Paşa | Şengal | li hember Êzîdiyan komkujî pêk anî |
| 11 | 1752-1753 | Dewleta Osmanî Fermandar Silêman Paşa | Şengal | Gund û cihên pîroz ên Êzîdiyan texrîb kirin û komkujî pêk anî |
| 12 | 1767-68 | Dewleta Osmanî Waliyê Musilê Emîn Paşa | Şengal | Komkûjî |
| 13 | 1770-71 | Dewleta Osmanî | Şêxan | komkujî |
| 14 | 1773-74 | Dewleta Osmanî Waliyê Musilê Emîn Paşa | Şengal | Herem, gûnd tê hilweşandin û komkujî hat kirin. |
| 15 | 1779 | Dewleta Osmanî Birayê Waliyê Musilê Emîn Paşa | Şengal | li hember Êzîdiyan komkujî pêk anî |
| 16 | 1785 | Dewleta Osmanî Waliyê Mûsilê Ebd El Baqî | Denenedî | Komkûjî |
| 17 | 1786-87 | Dewleta Osmanî Waliyê Amediyê | | Êzîdî rastî komkujiyê hatin. |
| 18 | 1789- 1792 | Eşîrên li derdora Şengalê | Şengal | Sedan êzîdî hatin qetilkirin |
| 19 | 1792-93 | Dewleta Osmanî Waliyê Mûsilê Muhammed | Şengal | Malbatên ji 8 gundên Ezîdiyan hatin qetilkirin |
| 20 | 1794-95 | Dewleta Osmanî Silêman Paşa | Şengal | Hilweşandin û talan kirin |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 21 | 1802-1803 | Dewlet Osmanî Waliyê Mûsilê Elî Paşa | Şengal | Komkûjî, şewitandina zêwiyan û daran |
| 22 | 1809-1810 | Dewleta Osmanî Waliyê Bexda Silêman Qatil | Şengal, Balad, Mîhîrkan | Komkujiyeke mezin li hember Êzîdiyan pêk anî. |
| 23 | 1832-33 | Dewleta Osmanî Mîr Muhammed Rewanduzî | herêma Akrê û Zapê | Komkujî, îşkence, dîl girtin |
| 24 | 1836 | Dewleta Osmanî Waliyê Amedê Reşîd Paşa | Rojhilatê Amedê, Xerzan, Tel Afer û Şengal | Hezaran Êzîdî hatin qetilkirin, bi sedan esîr hatin girtin û weke koleyan hatin xebitandin |
| 25 | 1846 | Dewlet Osmanî Waliyê Mûsilê Tayyar Paşa | Şengal | gelek gund şewitand û wêran kir |
| 26 | 1856 | Dewleta Osmanî | Dêrsim | Piştî serhildana li dijî Osmaniyan bi ser neket, bi Kurdên Dêrsimê re Ezîdî jî rastî komkujiyê hatin |
| 27 | 1872 | Dewleta Osmanî Waliyê Bexda Mîthat Paşa | Şêxan | sedan mirovên Ezîdî hatin qetilkirin |
| 28 | 1879 | Dewleta Osmanî | Şengal | 15 hezar Êzîdî ji Eşîra Sîpka yan koç yan jî sirgûnî Qafqasya hatine kirin |
| 29 | 1890 | Dewleta Osmanî | Başûrê Kurdistanê | sedan Êzîdî hatin |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | | | | qetilkirin, sedan malbat koç kirin |
| 30 | 1892 | Dewleta Osmanî General Emer Wehbî Paşa | Şêxan û Şengal | cihên pîroz û gorên li wir texrîb kirin, peyva Ezîdî hate qedexekirin |
| 31 | 1914-1918 | Dewleta Osmanî | Şengal | Li ser Ermenî û Ezîdiyan komkûjî hate pêkanîn |
| 32 | 1918 | Dewleta Osmanî | Ermenîstan | Êrîş û Komkûjî |
| 33 | 2007 | El-Qeîde | Siba Şêx Xidir û Til Ezer ya Şengalê | 500 Êzîdî hatin qetilkirin, hejmara zarok û jinên wendane nayê zanîn |

Ew çend mînakên fermanên li ser civaka Êzîdî hatine meşandin jî dide xûyakirin ku, civaka Ezîdî, piştî pêşketina şaristaniyên bi dewlet û olên yekxwedayî hertim bûne hedefên êrîşan. Ol guhertin li ser wan hatiye ferzkirin, xwestekên serbixwe û xweser jiyan kirin, bi çand û baweriya xwe jiyan kirin hertim bi fermanan hatiye bersivandin.

Bêguman di hemû ferman û qirkirinan de herî zêde jin û zarok bûne hedef. Jin hatine dîl girtin, qetil kirin, tecawiz kirin û bi zorê ji çand û baweriya xwe hatine dûrxistin. Bi reya hebûn, cewher û nasnameya jinan, hebûn, cewher û nasnameya civakekê hatiye hedef girtin.

**<u>Fermana 74'an û Jenosîda ku Nayê Naskirin</u>**





Êzidiyên ku di axên xwe de 73 ferman jiyan kirin, di dîroka 3'ê Tebaxa 2014'an de, rastî fermana 74'an hatin. Li ser rabirduya wan axên qedîm, pelekî reş ya nû zêde bû. Çeteyên DAÎŞ'ê ya ji aliyê welatên heremê û hin welatên navnetewî dihatin xwedî kirin, li Şengalê li ber çavê dinyayê

fermanekî nû pêkanîn. Beriya wê 2 mehan, DAÎŞ wilayeta Nînowa ya navenda vê Musile, bêyî muqawemetekî bidest xist û piştî vê berê xwe da Şengal'ê. Li Şengal'ê hêzên hikûmeta Iraqê û PDK ku pêwist bû parastina civaka Şengal'ê bikirana, di nava 2 seetan de Şengal terikandin û civakê bi fermanekî nû re rû bi rû hiştin. 12.000 peşmergeyên Hikûmeta Herêma Kurdistanê ku ji bo parastin û ewlekariya Şengal'ê erk girtibûn, çekên xwe jî girtin û ji Şengal'ê reviyan. Gelek wenê û belgeyên ku vê yekê piştrast dikin hene û di rapora UN ya Jenosîda Şengal'ê de tê payîn ku şîrîkên fermanê hene. Di encam de, DAÎŞ li Şengal'ê, bi hezaran mirov kuştin, bi hezaran ji wan dîl girtin, piştî fermanê bi hezaran jin hatin revandin, weke kole di bazaran de hatin firotin.





Dema êrîşên DAÎŞ'ê destpê dikin, hejmarekê mezin ya civakê berê xwe didin çiyayê Şengal'ê. Gelek ji wan zarok û mirovên temen mezin, ji ber bê derfetiyan ji tîna û birçiyan jiyana xwe ji dest dide. Yên ku dikarin di şert û mercên zehmet de jiyana xwe rizgar bikin jî, di şertên pir giran de tekoşîna jiyanê dan.

Bi sed hezaran Ezîdiyên ku nêçar man ji Şengal'ê koç bibin, bajar û bajarokên Başûrê Kurdistanê Duhok, Zaxo, Lalêş û Şariya belav bûn. Hejmarekê mezin li ser korîdora mirovî û ewlehiyê ya şervanên YPG-YPJ vekirin, koçberî Rojava û Bakurê Kurdistanê bûn. Di vê rêwitiya zehmet de hejmarekê pir mezin mirov jiyana xwe ji dest dan.





Ruxmê gelek lêkolînan, îro hîna jî bi daneyên şênber û fermî axaftin ne gengaze. Jixwe hîna beriya fermanê ji ber valatiya rêveberiya heremê giredayî avasaziya demografîk daneyên şênber û fermî nebûn. Lê dema em gelek lêkolîn û daneyan tînin kêleka hev;

Li gorî daneyên ne fermî û li gorî gelek lêkolînan tê guhertin; beriya êrîşên qirkirinê yên DAÎŞ'ê li Şengalê 550 hezar Ezîdî jiyan dikirin. Piştî fermanê zêdehiyên wan şêniyan koçî bajêr û welatên cûda bûn û rastî polîtîkayekî qirkirinê ya sîstematîk hatin. Hîna li kampên Başûrê Kurdistanê ya pênaberan de ji 135 hezar zêdetir Ezîdî jiyan dikin. Ji fermanê heta niha nêzî 130 hezar Ezîdî ji cih û warên xwe ber bi welatên cûda ve belav bûn. [2]

Li gorî rapora Neteweyên Yekbûyî ya Iraq'ê ya dawî; Heta niha 93 gorên komî ku Ezîdiyên li fermanê de hatine qetilkirin û tê de hatine binax kirin hatin dîtin. Lê li gorî tê texmîn kirin hejmara rastî ji ya hatiye tesbît kirin pir zêdetire. Li gorî wezareta parastin û kar û barên gorên komî ya Iraqê; ji sala 2019'an heta niha 62 gorên komî hatine vekirin, ji wan gorên komî heta niha 798 cenaze hatin derxistin. Li gundê Solax'ê li gorekê komî de, cenazeya 80 jin û 2 zarokan hatiye dîtin. Dîsa di dîroka 18.08.2024'an de, li Til Efer'ê gorekê komî hate vekirin, di vê gorê komî de, ji 1500 zêdetir cenaze hatin dîtin, piraniya wan kesan Ezîdiyên ku ji aliyê DAÎŞ'ê ve hatine revandin û qetilkirinin. [3]

DAÎŞ di heman demê de, 68 cih û perestgehên olî ya Ezîdiyan rûxand, şewitand û wêran kir. Rojên destpêka fermanê de; du jinên ciwan bi navê Naciya Hecî û Suad Brahîm, ji bo parastina perestgeha olî (Qubba Şêxmendê Qiblet) bikin û civakê ji DAÎŞ'ê rizgar bikin, li ber qubbe bi çekên ferdî ya malbatî şer dikin, DAÎŞ dema digihîje ber qubbê, bi wan jinan re, hejmarekê mirovên temên mezin ku nekarîn dûr bikevin, bi qubbê re diteqînin.





Dîsa li gorî rapora Neteweyên Yekbûyî ya Iraq'ê, di êrîşên DAÎŞ'ê de, 6500 zêdetir Ezîdî hatin revandin, ji wan 3500 zêdetir jin, nêzî 3 hezar jî mêrin. Heta niha 1211 jin, 339 mêr, 1076 zarokê keç û 964 zarokê kur ji destê DAÎŞ'ê hatin rizgar kirin. Piraniya mirovên ku hatine rizgarkirin, ji heremên weke Reqqa, Tebqa, Deyrezor, Hol ku destpêkê di vênerîna DAÎŞ'ê de bûn, bi destê

[2] https://iraq.un.org/en/278382-isil-attack-sinjar-august-2014-and-subsequent-acts-committed-against-yazidi-community-iraq

[3] https://www.rudaw.net/turkish/kurdistan/19092025

şervanê QSD-YPG-YPJ hatin rizgarkirin. Hîna jî aqûbeta ji 2500 kesê zêdetir mirovên Ezîdî nayê zanîn. [4]



1.Leyla Tahlo[5]



2. Cîhan Xîro Qesim[6]

Li Musilê Hezîran'a sala 2016'an 19 jinên Ezîdî ku di destê DAÎŞ'ê de dîlgirtî bûn, ji ber ku ferzkirina ola Îslamê red kirin û koletiyê qebûl nekirin, ji aliyê DAÎŞ'ê ve, bi saxî di nava qefesekê de hatin şewitandin.

Ezîdî di sala 2014'an de tenê bi qirkirina herî bi xwîn ya dîroka nêz re rû bi rû neman, di heman demê de, li ber çavên hemû cîhanê qirkirinekî jinan jiyan kirin.[7] Rûxmê ku li ser fermanê ji 11 salan zêdetir dem derbas bûye, hîna aqûbeta gelek jin û zarokên ku weke xanîmeta şer hatine revandin ne diyare. Li gelek deverên cîhanê, di bin navê bazirganiya kafiran de, bi hezaran jin hîna jî weke kolê tên bikaranîn. [8]

Gelek zarokên ku di fermanê de esîr ketin destê DAÎŞ'ê, di şerê DAÎŞ'ê ya dijî gelan de hatin bikaranîn. Zarokên temen biçûk ji perwerdeyê çek derbaskirin û weke şervan bikaranîn. Gelek ji wan jî weke bombeyê zindî hate perwerde kirin û bi zorê çalakî li wan dan kirin.

Ne dewletên heremê, ne jî ya cîhanê di mijara fermana Şengal'ê de berpirsiyartî negirtin li ser



3. Sufyan Reşîd Hecî- Sala 2018'an ji aliyê QSD vê li Reqqe'yê hatiye rizgar kirin

---

[4] https://news.un.org/en/story/2016/06/532312

[5] Leyla Tahlo sala 2017'an ji destê DAÎŞ'ê hatiye rizgar kirin

[6] Cîhan Xîro Qesim sala 2017'an ji destê DAÎŞ'ê hatiye rizgar kirin

[7] https://gulanmedia.com/kmr/story/13764/1621551181-11223-dai%C5%9F-li-firotina-jin%C3%AAn-kurd%C3%AAn-%C3%AAz%C3%AEd%C3%AE-mikur-hat

[8] https://www.amnesty.org.tr/icerik/irakta-ezidi-kadinlar-ve-kiz-cocuklari-acimasiz-bir-sekilde-cinsel-siddet-ile-karsi-karsiya

milên xwe. Dewleta Iraq'ê bixwe ku, Ezîdî di vê axê de jiyan dikin fermana 74'an weke Jenosîd nas nekir.  Îro rewşa heyî ya piştî fermanê dema li ber çavan tê girtin, rewşa mirovên ku koçberî kampan bûne, koçberî welatên cûda bûne û nikarin bizivirin ser axên xwe bi deh hezaranin. Qirkirin ango ferman bi awayekê cûda hîna jî berdewam dike.

Di aliyê din de, gefên li ser Ezîdiyan û Şengal'ê jî didomin. Hêzên heremî, civaka Ezîdî ku piştî fermana dawî vegeriyan li ser axa xwe, xwe birêxistin kirin û jiyana xwe ji nû ve tanzîm kirin, bi awayekê sîstematîk tehdît dikin. Ezîdiyên ku mekanîzmayên xwe yên parastina cewherî ava kirine û jiyana xwe bixwe birêxistin kirine, di serî de dewleta Tirkiye, hîna jî rastî gef û êrîşên gelek welatan tên. Li gorî bîlançoya Rêveberiya Xweser ya Şengal'ê, di êrîşên hewayî ya dewleta Tirkiyê ya piştî fermanê de, ji sala 2017'an heta niha 50 kes jiyana xwe ji dest dane, 22 kes bi giranî birîndar bûne. Ji wan êrîşan; di êrîşên 17'ê Tebax'a 2021'an de, balafirên şer ya dewleta Tirk, nexweşxaneya Sikêniyê bombebaran kir, di encama vê bombardimanê de  3 kedkarên tendûristiyê û 5 şênî jiyana xwe ji dest dan û nexweşxane bi temamî hilweşiya. 15 Hezîran'a 2022'an de balafirên şer ya aydî dewleta Tirk meclîsa gel ya Sinûnê bombebaran kirin, di encama vê bombebaranê de zarokekî bi navê Selah Naso(12) û Îbrahîm Derwêş jiyana xwe ji dest dan û 7 kes jî birîndar bûn. [9]



4.Meclîsa Gel ya Sinûnê



5. Nexweşxaneya Sikêniyê

## Li Ser Jinan Bandoriyên Fermanê

Fermana 74'an li ber çavê cîhanê qewimî, derfet û zirûfên sedsala 21. mîn de, hemû cîhan vê fermanê şopand, dît. Jinên Ezîdî li ber çavên cîhanê hatin kolekirin, revandin, şewitandin. Gelek dewlet û hêzên ku, hêza wan ya destwerdanê hebûn, alîkarî nedan, xwedî li berpirsiyartiyên xwe derneketin. Tenê 12 şervanên HPG-YJA-Star û piştre jî şervanên YPG-YPJ hatin alikariyê. Bi hejmarekê pir biçûk şervanan, parastina Şengalê hate kirin û destwerdana şervanan hişt ku pêşiya qetlîamên mezintir were girtin.

Gelek jinên ku ketin destê DAÎŞ'ê dîsa bi operasyonên taybet ya wan şervanan hatin rizgarkirin. Piştî fermanê li Şengalê ne hikûmeta Iraqê, ne jî rêveberiyekî fermî nemabû. Jixwe berê jî pir zêde îdare an jî rêveberiya dewletê li Şengalê nebû lê piştî fermanê, ew rêveberî ji binî ve ji holê rabûbû. Di vê navberê de, dîsa bi hêza şervanên HPG û YPG-YPJ û bi sedan jin û mêrên Ezîdî ku ji

[9] Daneyên Rêveberiya Xweser ya Şengalê

bo parastina xaka xwe çek rakirine 13.11.2015'an de Şengal bi temamî ji destê çeteyên DAÎŞ'ê hate rizgar kirin.



Şekil 1: Kismet Salih[10]



Şekil 2: Mehdiya Bişar Qesim[11]

Piştî rizgarkirinê, gel bi xwe kete nava hewldana ji nû ve avakirina jiyanê, ji aliyê rêveberî, parastin, perwerde, ewlekarî, xizmetgûzarî û hwd. gel bixwe bi derfetên xwe jiyana xwe yê nû avakirin. Civaka Ezîdî, rûxmê hemû polîtîkayên tinekirinê, rûxmê ferman û qirkirinekî ewqasî giran, di nava demekî pir kurt de sazî û dezgehên xwe yên jiyanê ava kirin. Ji nû ve çêkirina xanî û avahiyên xwe yên hilweşiyaye, heta nexweşxane û şaredariyan, ji dibistanan heta akademiyên gel, ji meclîsên gundan heta meclîsên ciwanan, ji saziyên çand û hunerê heta ragihandinê, di gelek aliyan de, bi derfetên xwe jiyana xwe hûnandin.

Lê derûniya ku fermanên bê navber û domdar li ser civaka Ezîdî, taybetî li ser jînên Ezîdî hiştiye, bi fîzîkî rizgarkirinê ji holê ranabe. Ji gelek malbatan bi dehan kes ketin destê DAÎŞ'ê, hin ji wan hatin qetilkirin, hin ji wan hatin rizgar kirin, hin ji wan hîna jî aqûbeta wan nayê zanîn. Gelek malbat ji hevdû belav bûn. Gundên weke Koço, Herdan, Til Qeseb hema hema ji binî ve ji holê rabûn.

Fermanên bê navber dihêlin ku di civakê de, hêsta di vê jiyanê de mayinde bûnê kêm bibe. Civaka Ezîdî ji ber ku pir zêde ji qirkirinan derbas bûye, berê xwe dayîna jiyana rojane pir zêde ye. Li her tiştê demborî meyzekirin, ji sibêrojê bi fikar bûn pir li pêşe Hêviyên pêşerojê, armanc û hedef lewaz dibin. Xeyalên pêşerojê gelek lewazin, ji ber ku mîsogeriya jiyanê nikarin bibînin. Taybet salên dawî hejmara xwekûştinên(întîhar) ciwanan pir zêde bûye. Jiyan demborî dîtin, tam ji jiyanê negirtin û herdem metirsiya fermanên nû jiyan kirin pir zêde ye. Ew aliyekî rastiyê ye.

Di vê mijarê de nêzîkatiyên dewletan û saziyên navnetewî, ji çareserî avakirinê zêdetir, nakokî û fikaran kûr dike. Gelek jinên ku ji destê DAÎŞ'ê hatine rizgar kirin, di adaptasyona civaka xwe de zehmetiyan jiyan dikin, bi destê saziyên navnetewî û rêxistinên NGO derdixin derveyî welat. Şûna ku, sedem û kiryarên fermanan ji holê rakin an jî hewl bidin civaka Ezîdî di axên xwe de di nava ewlehî û aramiyê de jiyan bikin, jiyana takekesî derdixin pêş. Jinên ku bi salane destê DAÎŞ'ê de mane, vê carê jî bi welatê xwe dûrketinê, ji civakbûna xwe dûr tên xistin.[12] Rêxistinên NGO ji bo

[10] Kismet Salih di sala 2017'an de ji aliyê QSD ve ji destê DAÎŞ'ê hatiye rizgarkirin
[11] Mehdiya Bişar Qesim di sala 2017'an de ji aliyê QSD ve ji destê DAÎŞ'ê hatiye rizgarkirin
[12] https://www.bbc.com/turkce/haberler-dunya-45204499

jinên ji destê DAÎŞ'ê rizgarbûne derfetê ew bixwe û ji malbatê 10 kes derxistina derveyî welat ava dikin. Ew derfet bixwe, encama polîtîkayên valakirin û bê mirovkirina Şengal'ê ye. Di aliyê din de, ew 10 kes di nava malbatan de, ji bo derketina derveyî welat dibe sedemê reqabet û nakokiyan. Gelek jinên ku ji destê DAÎŞ'ê rizgarbûne, di vê mijarê de rastî tûndî an jî zextê tên. Ango dikare were gotin ku, nêzikatiyên takekesî û malbatî bi xwe re çareserî nayîne, berovajî pêşî li tundî û tadeyên nû vedike. Lê gelek caran piştrast bûye ku pirsgirêk û derûniya fermanan, pirsgirêkekî civakî ye ango kolektîfe. Pirsgirêka mîsogeriya hebûn û azadiyê ya gelê Ezîdî, bi nêzikatiyên maf û azadiyên takekesî nikare were çareser kirin. Gelek jinên ku bi reya mûnazamayan derketine derveyî welat, rastî tûndiyekî derûnî ya mezintir hatine, gelek ji wan vegeriyane welatê xwe an jî di nava civakên din de heliyane. Ango şûna ku, metirsî û sedemên ku derûniyê xerab dikin ji holê were rakirin, çareseriyên demborî û derûniyên xerabtir derdikevin holê.

Rûxmê ew hilweşandin û fermana ku hemû cîhan tenê lê temaşe kir û ewqasî êşên ku hatine kişandin, li Şengal'ê hewaya serwer ne bê çaretî û belengazî ye. Ezîdî rûxmê hemû destwerdanan jî, bi berxwedanekê mezin hewl dan jiyana xwe ji nû ve avabikin û ew hewldan hîna jî didome. Yê ku Şengal'ê ji nû ve ava dike gelê Şengal'ê ye. Şengaliyên ku sazî û dezgehên xwe yên qadên jiyanê û hêzên xwe yên parastinê avakirine, niha ji bo parastina wan nirxan û ji bo ferman cardin neyên dûbarekirin, daxwaza naskirina statûya Şengalê dikin.

Jinên Ezîdî jî di roja me yê îro de, êdin naxwazin tenê bi fermanan û qirkirina jinan werin rojevê. Piştî Fermana 74'an jinên Ezîdî guherînên mezin jiyankirin. Bi ketina tevgera azadiya jinan ya Şengalê, di nava jiyana jinên Ezîdî de jî, ferq û cûdahiyên mezin derketin holê lê gelekî balkêşe ku, ew guherînên piştî sala 2014'an jiyan kirin, di esasa xwe de nûjen kirina qodên xwe yên dîrokî û çandî bû. Hêza jin, jixwe bawerî, xweparastin, pêşengtiya civakê kirin, qadên jiyanê de cihê xwe girtin û xwedî li jiyana xwe derketin bûn mijarên sereke û jinên Ezîdî di nava rastiya civaka xwe de, bi tekoşînekî pir alî, gelek taybetmendiyên xweyê berê careke din qezenc kirin. Di nava berxwedanekê bêhempa de, tekoşînekî jiyanê ya pir alî tê meşandin. Di gelek qadên jiyanê weke; perwerde, tendûristî, parastin, siyaset, aborî û hwd. jinên Ezîdî di nava tekoşîna avakirina jiyana nû dene. [13]






[13] https://rojnews.news/ku/riham-hico-li-sengale-serhildana-jinan-ne-tisteki-rehet-bu/

Di heman demê de, bi zayendperestiya ku jinan biçûk û derveyî tekoşînê dibîne re jî tekoşîn dikin. Beriya xwerêxistinkirin û perwerde kirina jinan, di nava civakê de hebûna jin bi gelek bandoriyên mêrsalarî biçûk dihate dîtin. Zewacên temen biçûk, pir jinan re zewac kirin, jin li derveyî qadên siyaset, aborî û perwerdê de hiştin, di malan de girtin, nezan û cahîl dîtin pir zêde bûn. Jinên Ezîdî di heman demê de, bi vê hişmendiyê re jî tekoşîn kirin û ew tekoşîn hîna jî berdewam dike. Li gel vê rojane bi gefên hêz û dewletên heremê û hişmendiya cîhadîst, jiyana nû ya li Şengal'ê hatiye avakirin, careke din tê hedef girtin.

**<u>Metirsiyên Piştî Êrîşên HTŞ û Şerê Li Bakur û Rojhilatê Suriyê</u>**

Di rojên destpêkê sala 2026'an de, bi destê HTŞ ( Heyet Tehrîr El Şam) û bi alikariya hêzên navnetewî li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, pêlên êrîşên nû destpê kirin. Ew êrîş di 6'ê Çilê'yê 2026'an de bi taxên Helebê ya Eşrefiyê û Şêx Meqsûd destpê kirin, piştre heremên weke Reqqa, Tebqa, Deyrezor, Til Koçer, Til Hemîs, Hol, Hesekê, Kobanê jî girtin nava xwe. Di nava wan pêlên êrîşan de qasî HTŞ, şaneyên çeteyên DAÎŞ'ê jî cihê xwe girtin û ewlehiya heremê kete bin metirsî û gefekî nû. Li gorî lêkolînên Akademiya Jineolojî ya Rojava di wan êrîşan de, herî zêde qadên sîvîl hatin hedef girtin. [14]

Nexweşxaneya Xalid Fecir ya Şêx Meqsud, di gundewarên ku Kurd tê de jiyan dikin de komkûjiyên ku pêk hatin rewşekî nû ava kir. Pêkhateyên heremê ya weke Kurd, Suryanî, Ermenî, Ezîdî bûn hedefên êrîşan, hîna jî ji pêkhateyên ku di Helebê de jiyan dikin agahiyekê piştrast nikare were girtin. Di heman demê de, dîmenên ku êrîşên çeteyên DAÎŞ'ê ya sala 2014-15-16 careke din tînin bîra mirovahiyê derketin holê. Jinên ku dîl ketin destê hêzên HTŞ weke kole hatin firotin, rastî tecawiz û tundiyekî pir mezin hatin. Li ser cenazeyên mirovên sîvîl û şervanên QSD û hêzên ewlekariya hindirîn îşkence hate kirin. Cih û warên pîroz ya baweriyên cûda hatin teqandin. Di gelek dîmenên kêliyên şer de tê dîtin ku, hêzên HTŞ êrîşekî sîstematîk li ser şêniyan taybetî li ser jin û zarokan dimeşînin. Endamê HTŞ yê nû, endamê DAÎŞ'ê yê berê Ramî El Deheş di nava şer de kêziyê şervanekê jin ya şehîd ketiye dibire û vê weke xanîmetekî şer bikar tîne. Hişmendiyê cîhadîst hebûna jin bi taybetî hedef digire û zimanê bê rûmetkirinê, nefretê û zayendperestiyê bikar tîne. Li gel wan kiryaran, koçberkirina bi zorê, rûxandina cihên çand û kevnar, rûxandin û talankirina sazî û dezgehên jinan, dizî jî taritiya ku mirovahî ji dîroka nêz ya êrîşên DAÎŞ'ê nas dike careke din anî bîra mirovahiyê û ew ceribandina qirkirinê mîna ya 2014'an, dîsa li ber çavên raya giştî û hêzên navnetewî pêkhat.

Di nava wan pêlên êrîşan de, mijarekî taybet jî girtiyên DAÎŞ'ê bûn. Hin girtîgehên girtiyên DAÎŞ'ê ku bi salanin di zindanên bin vênerîna QSD û Koalîsyona navnetewî de dimînin, kete bin vênerîna HTŞ, ji wan zindanan bi hezaran DAÎŞ'î ku destê wan di qirkirina bi hezaran mirovan û fermana 74'an de heye, serbest hatin berdan. Ango vênerîna zindana DAÎŞ'iyan kete destê hêzekî ku alikariya wan çeteyan dikin. Gelek dîmenên derketin holê piştrast dikin ku, ji wan zindanan bi sedan kes derketin, ji kampa holê bi hezaran malbatên DAÎŞ'iyan hatin berdan. Li gel vê, heta niha ji

[14] https://jineoloji.eu/bakur-u-rojhilata-suri-de-tawanen-ser-en-ku-hatine-kirin/

5hezar zêdetir girtiyên DAÎŞ'ê vegûhestin zindanên li Iraq'ê. Ew vegûhestin hîna jî didome. Piraniya wan girtiyan, ser çetene û destê wan di gelek qetlîamên bi xwîn de hene. [15]

Rewşa Rojavayê Kurdistanê û Sûriye niha di qonaxekî nû de ye. Hevpeymanekî di navbera hêzên QSD û hêzên vegûhêz ya hikûmeta Şam'ê de hate mohr kirin û mûzakere hîna jî berdewam dikin lê ew rewşa aramiyê çiqasî domdar be û rewşa heremê careke din bikaribe bizivire ser ewlehiyê, ne diyare.

**<u>Li Şengalê Fikarên Fermanên Nû û Rewşa Jinan</u>**

Piştî rewşa şer ya nû, li Şengal'ê û li ser gelê Ezîdî fikar û metirsiyên nû zêde bûn. Ew rewş hem jî aliyê hêzên ku şer gûr dikin ve, bi awayekî sîstematîk tê bilêv kirin hem jî çete û şaneyên DAÎŞ'ê ku piştî şerê dawî careke din ketin tevgerê, ji bo Şengal'ê metirsiyekî mezin didin avakirin.

Sedemên fikarên kûr ya Ezîdî jiyan dikin ewin;

1. Sînora Iraq-Sûriyê ku di destê hêzên QSD de bûn, kete destê hêzên HTŞ, ango cîranê deriyê ya Şengal'ê bû hêzekê cîhadîst ku destê vî di gelek komkûjiyên etnîkî, olî, zayendî de heye.
2. Girtiyên DAÎŞ'ê ku destê wan di fermana 74'an de heye, hejmarekî mezin, di bin navê di nava aloziyê de reviyan, ji zindanan serbest hatin berdan, hejmarekî mezin jî weke girtî hatin qada Iraq'ê. Metirsiyên ku ew çetê careke din serbest werin berdan û berê xwe bidin Şengal'ê heye.
3. Kampa Holê ku aliyê Sûriyê de dibe cîranê sînor ya Şengal'ê de, vênerînekî pir cîdî û fermî nema. Ji vê kampê bi hezaran DAÎŞî û malbatên DAÎŞ'iyan derketin û ber bi ku derê ve çûn ne diyare.
4. Di Kampa Holê de û heremên din yê Sûriyê de hîna jî gelek esîrên Ezîdî ya fermana 74'an hebûn. Gelek ji wan ji bo bi qetlîamekî nû re rûbirû neyên nasnameyên xwe vedişartin ango tirsekî mezin jiyan dikirin. Piştî rewşa dawî, aqûbeta wan esîran dê çawa bibe ne diyare.
5. Heremên dewletê ya mîna Tirkiye, rojane gef li Şengal'ê dixwin ku, ew der jî mîna Bakur û Rojhilatê Suriyê bi şerekî re rû bi rû bihêlin. Taybet daxûyaniyên talî ya Wezirê Karên Derve ya Tirkiye Hakan Fîdan ku got; "Heşdî Şabî bejahî, em hewayî lêdin, emê 2-3 rojan de operasyona Şengal'ê tamam bikin" li heremê fikaran zêde kir. [16]
6. Ji 10'ê Sibatê û şûn ve, artêşa Iraqê li derdora Şengal'ê liv û tevgera xwe zêde kiriye, di hatin û çûyînên welatiyan de, di çalakiyên civakî de zext li ser civakê tê meşandin.
7. Nîqaşên reya bazirganiyê, nîqaşên destwerdana li ser Iraqê û hwd. ji aliyê dewletên weke DYA û Îsraîl'ê vê tê meşandin, ji bo herema Şengal'ê metirsiya şerekî nû derdixe holê.

Ji ber wan sedeman û gelek sedemên ku me li vir neanînê ziman, li Şengal'ê metirsî û fikarê fermanekî nû roj bi roj zêde dike.

**<u>Encam</u>**

---

[15] https://rojnews.news/ku/ceteyen-daise-li-xwe-mikur-ten-ku-li-diji-ezidiyan-komkuji-kirine/

[16] https://artigercek.com/politika/fidandan-sengal-aciklamasi-hasdi-sabi-karadan-biz-havadan-23-gunluk-operasyon-343094h

Şengal û gelê Ezîdî ne gelê Ezîdî ya beriya 2014'ane. Di nava 12 sala derbas bûyî de, gelek pêşketin û guherîn, di vê erdnîgariyê de hatin jiyan kirin. Fermana 74'an bi xwe re, li gel êşên mezin, rûh û vînekî mezin ya berxwedanê jî ava kir. Parastina cewherî, xweparastin, xwe bi xwe rêvebirin û her wiha di gelek mijaran de, gelê Ezîdî 12 salin rûxmê hemû bê derfetiyan li berxwe dide. Di giştî civakê de nêrîna hevpar ya derdikeve pêş ewe ku; "Ezîdî ne Ezîdiyên berê ne, ewê xwe biparêzin" Ew li beramberî rewşên ku derdikeve holê helwesteke.





Heman sekn di jinên Ezîdî de jî heye. Dibêtiya di şerekî nû de, dê weke berê ji welatê xwe dûrketin an jî xwe spartina hêzekî derve wêdetir; helwesta xweparastin û bi hêza xweyê cewherî pêşeroja xwe parastin roj bi roj zêdetir dibe. Lê ew rastî, sekn û helwest, metirsiya komkûjî û şerên nû ji holê ranake.

Civaka Ezîdî rûxmê tekoşîna salan jî, di nava makezagona Iraqê de, cihê xwe bi awayekî fermî nagire. Mekanîzmayên parastinê, rêveberiyê, aboriyê ku gelê Ezîdî bi derfetên xwe ava kiriye, bi awayekî fermî nayên qebûl kirin. Ew jî bixwe re mîsogeriyekî nayne, di vê pêvajoya xeternak de, ji bo rê li ber jenosîdên nû venebin, gava bingehîn ya pêwiste were avêtin, hebûna gelê Ezîdî, sazî û dezgehên vê, mekanîzmayên wê ya parastinê bi awayekî fermî di zagonên Iraq'ê de naskirine.

Ji ber ew rewşana; piştî şerê dawî; li Şengal'ê derûniya fermanê careke din rû daye. Li gel biryara berxwedan û xweparastinê de, derûniya ku heman komkûjî careke din dûbare bibin pir zêde ye. Gelek jinên ku di vê pêvajoyê de nêrînên xwe tînin ziman, di heman rastiyê de dibin yek; "Dema QSD-YPG-YPJ li ber sînor bûn, me bi şev rehet xew dikir, lê piştî şer em heta sibehê ji fikaran nikarin xew bikin" an jî nêrînên "Ew DAÎŞ'iyên ku anîne Iraq'ê, ewê serbest berdin û careke din berê wan bidin me" pir zêdene. Baweriya jinan ne bi dewletê, ne jî bi hêzên navnetewî tê. Ji ber ku ji dîrokê heta niha heman rewşê dûbare dûbare jiyan kirine, berxwe jî dane lê ji fermanên mezin derbas bûne. Hêzên ewlekarî û parastina heremê YBŞ-YJŞ û Asayîşa Ezîdxanê ku piştî Fermana 74'an hatine avakirin, weke hêza esasî ya parastina heremê tê dîtin lê îro ew hêz ji bo werin belavkirin û bê bandor kirin, li ser civakê zextekî mezin tê meşandin. Plansaziya hêzên xwecihî ya Şengal'ê ji holê rakirin û ewlehiya heremê dîsa spartina hêzên derve heye ku ji dîrokê heta niha pir bi zelalî hate dîtin ku, ew rêbaz ji bilî fermanên nû, ti çareserî bixwe re nayîne.

Di vê pêvajoyê de, ji bo ferman dûbare nebin ketina tevgerê ya raya giştî di girîngiyekî jiyanî deye. Hikûmeta Iraq'ê, dewletên heremê û dewletên navnetewî pêwiste statû û hebûna Şengal'ê, vîn û îradeya vê ya xwecihî nas bikin û çareseriya ji bo Şengal'ê ne li derveyî Şengal'ê bigerin. Polîtîkayên bê mirovkirina Şengal'ê, hedefgirtina çand, bawerî û civakîbûna gelê Ezîdî neyê hedef girtin.

Hişmendî, zanebûn û xwe komkirina ku 12 salan de derketiye holê, ji bo careke din belav nebe û civaka Ezîdî careke din ji cih û warên xwe nebin, ji komkûjiyan derbas nebin, ketina tevgerê ya herkesekî xwedî hişmendiya mirovahiyê ye, pir girînge.

Akademiya Jineolojî ya Şengal'ê